
# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (187):

## Gundê "Basûfanê" yê Êzdî - tewanin rêbazkirî, tewankariya "Feyleq Elşam" ne kêmtirî ya "Emşat" e, girtinên nesûcane, qutkirina dar û daristanan


















موقع القاعدة العسكرية التركية في قرية "باصوفان"- جبل ليلون، قبل وبعد قلع الأشجار




















المدني عبد الرزاق طراد العبيد- من ريف حماه، قُتل تحت التعذيب في ٢٠٢٢/٢/٢٤، لدى فيلق الشام في جنديرس






Ji ber ku vê carê kuştiyê vêguneh ji anîndeyan bû û êleke wî ye ku lê bipirse heye, vêca Milîseyên "Feyleq Elşam" neçar bûn lixanin ku ew tewana di biryargeha wan a ewlehiyê de hatiye kirin, û hêzên ewlehiyê ketin amedebaşiyê da ku lêkolînê tê de bikin; Lê tewanên weke wê yên ku di dermafê Kurdan de -niştecivên resen- hatine kirin, têne girtin û piraniya wan li dijî nediyardeyê têne tomarkirin.

**Vaye li jêr hin binpêkirin û tewanên belgekirî:**

**= Gundê "Basûfanê":**

Yek ji gundên Êzdî yên mezin li Çiyayê Lêlûn e, /35/K.M bi aliyê Başûr ve ji navenda Bajarê Efrînê dûr e û pê ve girêdayî ye, ji dora /300/malî pêkhatî ye, dora /2000/nişte ji Niştecivên Kurd ên Êzdî yên resen tê de bûn, di dema dijberiyê de hemî penaber bûn, tenê jê /75malbat=200nişte/ vegerîn, ên din jî zorane koçber bûn, û dora /150malbat= 1000nişte/ ji anîndeyan tê de hatin niştecîkirin.

Û berî dijberiyê bi hindikî û di dema wê de gund û derdorê dora deh caran bi balefir û top'avêjan hatin topebarankirin, û di encamê de ziyan bi piçekî gihîşte mala kevin a şêxê dilovanber "Cimo Elî Oso".

Berê gund di bin desteseriya Rêvebiriya Xweser de bû û bi "Artêşa Azad" re sînordar bû, bêtirî carekê tûşî topebaran û dijayetiyê bibû, û li 27.4.2016an Z ziyanin şênberî gihîştinê û hin hemwelatiyên wê jî hatin kuştin û hin jî birîndar bûn.

Milîseyên "Feyleq Elşam" ên ku Mala "Silêman Ce'ifer" ji xwe re kirine biryargeheke leşkerî gund desteser dikin, dest danîn ser malên hemwelatiyên ku zorane koçberbûyî tevî tiştmiştên tê de, û ji malên din jî xwarinvexwarin, firaxên baqirî, cerên gazê, şaşên tilvizyona, alav û amûrên elektirîkê û hin tiştên din dizîn.

Weha jî wan dest danîn ser tevahiya nanpêjgeha otomatîk a nûjen li gel giropa zayenda elektirîkê û tevahiya mala li rex wê, yên kurên Dilovanber "Ezedîn Şêxo".

Herweha jî wan milîseyan ji bo lêgerîna li kevneşopên dîrokî û dizîna wan, gelek ciyên li nav gund û li Cîgeha "Keferlab" - li Rojhilatê gund, li pêş çavên xelkê kolan.

Û xelkê gund ên mane rastî hemî cûreyên binpêkirin û tewanan hatin, mîna kuştin, revandin, girtin, îşkencekirin, rûmetnizimkirin, peresitandin û hin kiryarên din. Û bi dehan ji wan -di nav de jî jin- hatin girtin, û mekin hatin îşkencekirin, nimûne: 1- Piştî ku bombeyeke zemînî li Gundê "Bihiyê" yê hevcîwar li 4.12.2020an Z bi otombîla serkêşekî "Feyleq" de teqiya, wan hilmeteke girtinê li gund çêkirin, û di wê hilmetê de Hemwelatî "Xezalê Menan Selmo/50/sal" hate girtin, bo hepsa "Feyleqê" ya taybet li Gundê "Îska" hate şandin, û ta niha çarenûsa wê ne diyar e. 2- Li 30.3.2020an Z, Hemwelatî "Dilgeş Umer Erebo" ji aliyê endamin "Feyleqê" ve hate qurşînkirin ji ber ku wî fermana wan a ji bo valakirina mala wî red kir, lê paşê çêbû. 3- Li dema ku Hemwelatî "Xezalê Oso Keça Cimo Elî/69/sal" -piştî penaberiya Buhara 2018an-vedigeriya gund, li Gundê "Kibêşînê", ji aliyê rêbenda milîseyan ve hate armanckirin, qurşînek lêket û paşê çêbû; Lê bi zorê malbat in ji anîndeyan vê re dan rûnişkandin.

Weha jî ew tûşî bindestiya olî bûn, û Zaretgeha "Şêx Elî" ya Êzdî li orta gund, ji aliyê "Feyleqê" ve, li roja yekê ji Rojiyê 24.4.2020an Z, bi tekbîran û bi behaneya ku ew ya gawiran e, hate roxandin û kelûpelên tê de hatin dizîn; Û di pê re ji bo cîlawkirina rûyê dagîrkeriyê, û ji berî seredana serokê Hemahengiya Sûrî yê berê "Nesir Elherîrî", qubeya zaretgehê hate çaksazkirin; Û ji qereziya xelkê re, Mala "Henan Nasêr Erebo" kirin

mizgeft, û hin caran xelkê neçar dikin ku herin nimêjê jî tê de bikin, herweha hin gorên miriyan jî hatin wêrankirin, bi taybetî jî yên bi Zimanê Kurdî li ser hatine nivîsandin.

Û Artêş û Istîxbaratên Turkiyê jî Vêla duqatî ya kurên Dilovanber "Nebî Mûse Nebo" kirin biryargeheke leşkerî, dora hezar darên zeytûn, tirî û hin din li dorê yên "kurên Dilovanber Cimo Elî Oso, Mihemed Elî Qerno, Elî Hesen Oso, Malbata Mirco" ji bo çêkirina xelkeke ewlehiyê li dor xwe hilkirin, herweha jî ji bo avakirina bargeheke leşkerî, hezar darên zeytûn, hejîr, behîv û gûzê yên "Qedrî Silêman, Mûse Silêman, Cim'a Cimo, Silêman Ce'ifer, Bekrî Ce'ifer, Elî Ce'ifer, Hisên Hisên, Nasêr Hesen Nebo" qut kirin. Û milîseyan jî ji bo êzingkirin û bazirganiyê, li dor gund dora du hezar darên cûrbecûr ên biber qut kirin.

Û bi sedema dagîrkeriyê, ji hemwelatiyên gund sivîlin pakrewan bûn:

- "**Nîzar Silêman Erebo**/35/sal, **Selmo Betal Selmo**/50/sal", li 7.2.2018an Z, li dema xizmetgûzariya wan di navenda asayêşê de.

- Zarok "**Rolava keça Xalêd Mihemed Elî Qarno**/10/sal" ji koçberên "Basûfanê", li 23.9.2021an Z, di nexweşxaneyeke Helebê de, bi sedema bombeyeke zemînî li Gundê "El'ehdas" - Bakurê Helebê ji berî wê bi rojekê.

- "**Xelîl Sûrî Oso**/33/sal", li 2.8.2019an Z, bi bombeyeke zemînî li nêzîk Gundê "Bircqasê", li dema vegera wî ji herêmên penaberiyê li Şehba'ê bo gundê xwe.

**= Tewankariya "Feyleq Elşam" ne kêmtirî ya "Emşat" e:**

Li 24.2.2022an Z "Ebid Elrezaq Tirad El'ubêd - zayenda Mezraf 1977 Z" - (Miherdê - anîndeyê Gundewarê Hemê) ê sivîl, ji Bajaroka "Celemê" - ciyê rûniştina xwe derket da ku biçe Bajarê Cindirêsê, ew venegerî, û li siba roja din Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê" xwediyên wî agahdar kirin da ku termê wî radest bibin, û hate xuyakirin ku ew bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a Rojhilatê Ferêt re, li ba ewlehiya Milîseyên "Feyleq Elşam" girtî bû, û di bin îşkencê de jiyana xwe ji dest da; Vêca endamên êla wî ketin amedebaşiyê, rewş li navçê û gund tevlihev bû, û amedebaşiyeke leşkerî li Efrîn û Cindirêsê çêbû.

Divê bi bîr were ku "Feyleq" ji "Firqit Elsultan Silêman Şah" û serkêşê wê "Mihemed Elcasêm - Ebû Emşe" (yê ku di gendelî û tewanê de deng daye) ne kêmtir e; Û me berê di du raporan de (119- 5.12.2020an Z, 155- 24.7.2021an Z) li ser nivîsandibû, û me gotibû ku serkêşên wê yên mezin (Munzêr Siras - Ebû Ubade, Heysem Mehmûd Rehme, Mihemed Nezîr Elhekîm) di Rêxistina Birayên Misilman - Ixwan Elmislimîn û rêvebiriyên Hemahengiya Sûrî ya Rikber - Istanbûl de endamin berz in, û me tekez kiribû ku zîndanên wê yên diziyane hene, û yên herî berz jê jî li Bajaroka Meydan Ekbezê - N.Reco û li tîmargeha Dilovanber "Farûq Ezet Mistefa" li Gundê "Îska" - Şêrewa ne, û di hindir wan zîndanan de yên têne revandin û girtin rastî îşkencekirineke mekin, veşartin an bendkirina zorane yên dirêj tên, bê ku wan bidin dadgehkirin -ta ku wêneyî bin jî- yan jî parêzeran ji xwe re bigirin; Û di vî warî de ji berî heyvekê "Feyleqê" hin girtî li "Îska" û ji wan jî "Hesen Şukrî Sîdo/36/sal" (ê ku ji 16.11.2018an Z ve bendkirî) da Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê, û ji bilî wî jî Hemwelatî "Elî Xelîl Xelîl/42/sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" ji salekê û neh heyvan ve tê de zorane bendkirî ye, bi ser ku têkeliya wî bi Rêvebiriya Xweser a berê re tune ye. Û bi ser de Feyleqê gelek binpêkirin û tewanên din jî kirine, û "Selîl Elxalidî û Pêşrew (Ra'êd) Hîşam Elhumsî"li "Meydan Ekbezê" bi gendelî û binpêkirinan û "Ebdela Helawê û Ebdo Osman" li "Basûtê û Bircebdalo" bi kargeha şênberên tevzînok (hişbirîn) deng dane.

Û ta niha jî çarenûsa "Xezalê Menan Seydo ji 4.12.2020an Z ve, û Şakêr Şêxo Şêxo ji 16.2.2022 ve" (yên ku li ba Feyleqê girtî û veşartî) ne diyar e.

**= Girtinên bêsûcane:**

**Destlatên Dagîrker ev girtin:**

- Ji heyvekê ve Hemwelatî "Mihemed Hemo Hemoko/67/sal" ji xelkê Bajaroka "Be'idîna", ji aliyê Asayêşa Reco ve, bi sedema şabûna wî bi barîna berfê û sipehiyê li şûna zor û zordariyê li ser Rûpela Hevgîhana Civakî, û ta niha li Reco girtî ye, û malbata wî nikane tibaba sezaya diravî /2/hezar P.T bide ta ku bê berdan; Û divê were bîranîn ku kurê wî "Mihemed Hemoko kurê Mihemed/22/sal" jî, ji du sal û nîvan ve, bi tewanbariya têkeliyê bi R.X a berê re, li Istanbûlê hate girtin, û bi çar salan hepis hate cezakirin.

- Li 11.2.2022an Z, ev hemwelatî "Mihemed Hemîd Hebîb/60/sal (ê ku piştî pênc rojan hatiye berdan), kurê wî Hebîb Mihemed Hebîb/24/sal, û kurê birayê wî Mihemed Fewzî Hebîb/26/sal, Ferhad Elî Birîmo/31/sal" ji xelkê Gundê "Şadêrê" - Şêrewa, ji aliyê Asayêşa Leşkerî li Cindirêsê ve; Ew rastî îşkencekirineke mekin hatin, û piştî ku her yekî ji wan sezayeke diravî bi qasî /2000/P.T dan hatin berdan.

- Li 13.2.2022an Z, ev hemwelatî "Hisên Îbrahím Heco/67/sal, Mihemed Heyder Mihemed/60/sal cara dudiyê û li 17.2.2022an Z hate berdan, Şukrî Hisên Bakîr/58/sal cara çarem, Selah Menan Şêxo/55/sal" ji xelkê Gundê "Qude", ji aliyê Asayêşa Reco ve û bi hevkariya bi Milîseyên "Firqit Elhemzat", piştî ku hemwelatî "Asiye Hisên Mûse /60/sal" sê rojan hate girtin, a ku berê jî li Havîna 2018an Z, bi behaneya dîtina wê di wêneyekê de li ser Rûpelên Hevgîhana Civakî li rex termên endamine milîseyan -ên ku di dema êrişkeriya bi ser gund de hatibûn kuştin, çar heyvan hatibû girtin. Û li 21.2.2022an Z jî, ji heman gundî ev hemwelatî "Mihemed Şêxo Me'imo/65/sal, Cemîl Ebdo Şêxo/63/sal, Hesen Elî Mûrad/58/sal", ji aliyê Asayêşa Reco ve, bi tuhmeta têkeliyê bi R.X a berê re, û ta niha girtî ne.

- Li 16.2.2022an Z, Hemwelatî "Şakêr Şêxo Şêxo/35/sal" ji xelkê Bajaroka "Celemê" - Cindirêsê, ji aliyê Milîseyên "Feyleq Elşam" ve, û ta niha çarenûsa wî ne xuya ye.

- Li 17.2.2022an Z, Temenmezin"Yûsêf Eslan Ebid El'ezîz" ji xelkê Gundê "Sêmalka" - N.Mabeta - yê ku li Bajarê Efrînê rûniştî, ji aliyê asayêşê ve, bi tewanbariya têkeliyê bi R.X a berê re.

- Li 19.2.2022an Z, Hemwelatî "Mihyedîn Xalêd Ne'isan/43/sal" ji xelkê Gundê "Elemdara" - N.Reco, ji aliyê "Asayêşa Leşkerî" ve, li Taxa Eşrefiyê li Efrînê, bi tewanbariya hevpişkiya wî di parêzvaniya şevayî de li dema R.X a berê, û ta niha jî bendkirî ye.

**= Qutkirina dar û daristanan:**

- Milîseyên "Lîwa'i Semerqend" du darên sindiyanê yên Romî û temenmezin (bêtirî 250 salî), ya yekê bi tevahî li Cîgeha "Xirabî Şêxa" - Bakurê Bajaroka Kefirsefrê, û ya dudiyê jî li Başûrê bajarokê bi awakî bêwijdan û hovane qut kirin.

- Bi beramberkirina di navêna du wêneyên (Rezbera 2017an Z berî dagîrkirin û qutkirinê, Tebaxa 2020an piştî dagîrkirin û qutkirinê) ku ji aliyê Gogêl Êrs ve, ji daristana Zaretgeha "Qaziqlî" re - N.Cindirêsê (bi rûberiya dora/6/K.M) hatine kişandin re , bi zelalî asta qutkirina fere ya li ser destên milîseyan, ji wê daristanê re tê xuyakirin; Û ji ber ku ji dîroka wêneya dudiyê û vir ve (yanê ji bêtirî du sal û nîvan ve) qutkirin hîn berdewam e, vêca tê bala mirov ku gereke niha ew daristan bi temamî hatibe qirkirin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

- Li 22.2.2022an Z, giropeke ji Milîseyên "Asayêşa Leşkerî li Efrînê" êrişî navendeke "Asayêşa Sivîl li Efrînê" kir, bi sedema nakokî û hevtêvedanekê di navêna endamekî ji ya yekem bi endamin navendê re, û bi ser ku sivîl li navendê hebûn jî qurşîn hatin avêtin, û du endamên navendê û jinekê birîndar bûn.

Xwediyên hepsiyan (ên ku li ba "Feyleq Elşam" veşartî û zorane bendkirî) bang dikin da ku çarenûsa wan bê diyarkirin û di cî de werin berdan; Û tirsek mezin li ser jiyana wan heye, çimkî ev milîs bi işkencekirin û kuştinê navdayî ne.

27.02.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Mala kevin a şêxê dilovanber "Cimo Elî Oso" ya ku ziyan gihîştiyê - G.Basûfanê.
- Cîgeha kevneşopî "Keferlab" a hatiye kolandin - G."Basûfanê".
- Girtiya ku zorane veşartî "Xezalê Menan Selmo" - G.Basûfanê.
- Zaretgeha "Şêx Elî" ya Êzdî ya roxandî - G.Basûfanê.
- Vêla duqatî ya zaroyên Dilovanber "Nebî Mûse Nebo" ji berî dagîrkirinê - G.Basûfanê.
- Cîgeha Bargeha Leşkerî ya Turkî, berî û piştî dagîrkeriyê - G.Basûfanê.
- "Nîzar Silêman Erebo, Selmo Betal Selmo, Rolava keça Xalêd Mihemed Elî Qarno, Xelîl Sûrî Oso" yên pakrewan.

- Vêgunehê ku jiyana xwe jidest daye "Ebid Elrezaq Tirad El'ubêd".
- Bendkiriyê zorane li ba Feyleq Elşam "Xelîl Elî Elî".
- Ciwanê ku li Istenbûlê girtî û bi çar salan hepis sezakirî "Mihemed Hemoko kurê Mihemed".
- Dara sindiyanê ya temenmezin - Başûrê B.Kefirsefrê, berî û piştî qutkirina bêwijdan.
- Daristana Zaretgeha "Qaziqlî" - N.Cindirêsê, li (Rezbera 2018an Z berî dagîrkirin û qutkirinê, Tebaxa 2020an Z piştî dagîrkirin û qutkirinê) - li gor Gogêl Êrs.